


Wêje û Rexne

hejmar: 3 sal: 2014

kovara lêkolîn, rexne û teoriya wêjeyê

îlon · cotmeh · mijdar · kanûn



WÊJE Û SÎNOR

WÊJE Û REXNE

Kovara Çar Mehane ya Lêkolîn, Rexne û Teoriya Wêjeyê
Weşana Demane-Hejmar: 3/2014 (Çarmehî)
Îlon·Cotmeh·Mijdar·Kanûn

ISSN: 2148-2500

XWEDJYÊ KOVARÊ Ahmet Kan

EDÎTOR Davut Yeşilmen-Abdullah Çelik

LIJNEYA WEŞANÊ Bawer Berşev, Bextewer Zozanî, Emin Aslan, Fatoş Uzunca,
İlyas Suvagci, Mesûd Serfiraz, Ömer Delikaya, Özlem Akkan, Semra Güçlü, Serdar
Ay, Tahir Taninha

RASTKIRIN Mesûd Serfiraz (Kurmancî), Memê Mala Hinê (Sorani), Esat Şanlı-
Rohelat Aktulum (Kirdkî)

ŞÊWIRMENDÊ HUNERÊ Ömer Delikaya

KARÊN ABORÎ Bawer Berşev

SÊWIRANDINA BERG Û RÛPELAN Aysel Kazıcı Özalp (Şemal Medya)

TÊBINÎ Mafê çapkirina gotaran, tenê di destê lijneya weşanê de ye. Lê nivîskar ji
naveroka nivîsên xwe berpirsiyar in. Herweha nivîsên ku ji kovarê re têne şandin,
neyêne weşandin ji li nivîskêr nayêne vegerandin û bi şertê ku çavkanî bê nişandan,
jêgirtina ji kovarê serbest e.

WÊNEYÊ BERGÊ Selmet Güler- Sînor

ÇAPXANE Kayhan Matbaacılık Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.
C Blok No 244 Topkapı İSTANBUL | Tel: 0212 576 00 66

ŞERTÊN ABONETIYÊ Buhayê kovarê 10 ₺ û ji bo Ewropa jî 10 € ye.

Abonetiya ji bo salekê li welêt 30 ₺ û ji bo Ewropayê 30 €

Hesabê Banqeyê: IBAN: TR58 0001 0011 5027 4651 8050 04

Hesab TL: 1150-27465180-5004 Ziraat Bankası/Ofis şubesi Diyarbakır

Xwediyê Hesêb: Ahmet Kan

Hesabê USD: TR040001001150274651805006

Hesabê EURO: TR740001001150274651805007

NAVNÎŞAN Yenişehir Mah. Prof. Dr. Selahattin Yazıcıoğlu Cad. Oryıl My Office A
Blok, No: 2 Kat 2 Yenişehir / DİYARBAKIR

TEL 0(530) 347 86 62 (ji bo naverokê), 0(553) 396 13 06 (ji bo aborî û abonetiye)

WEB www.wejeurexne.com facebook: wejeurexne twitter: wejeurexne

E-MAIL wejeurexne@gmail.com skype: wejeurexne

NAVEROK

Ji edîtor/5

Ji edîtorî ra/7

Îbrahîm Seydo Aydogan: Romana Kurdî û Rexne û Ziman/9

Roland Barthes: Mirîna Afîrînerî/43

Haşim Ahmedzade: Nasname û Ziman/49

Ciwanmerd Kulek: Romana Kurdî: Pelek û Pêlek (1928- 1978)/65

Şiko Omer Kakereş: Di *Hesar û Segên Bavê Min* de
Girêdana bi Serdema Berî Mirîna Bav ve/81

Abdullah Çelik: Modernîte Ra Dîma Raştîya Komelî de
Tehlîlê Şîra Malmisanîjî *Rehmet Şerîfîyê Serdeştî*/91

A.Rahman Adak: Di Edebiyata Klasîk ya Kurdî de Mesnewiyên *Leyla û Mecnûnê*/99

Esat Şanlı: Şinasnayîşê Kitabê *Şairên Klasîkên Kurdîyê* Ebdurreqîb Yusîfî/121

Cibran Xelîl Cibran: Zîwanê Şîma, Şîma rê; Zîwanê Mi, Mi rê/131

WÊJE Û SÎNOR

Hevpeyvîn: Bi Remezhan Alan re li ser Sînorên Wêjeya Kurdî
Hevpeyvîn Mesûd Serfiraz-Dawîd Yeşîlmen-Şehmuz Kurt/136

Dilawer Zeraq: Wekî Biwara Desthilatê:
Di Wêjeya Kurdî û Tirkî de Dike û Nimandin/161

Wendelmoet Hamelink-
Hanîfî Barîş:

Dengbêj di Sînoran de:
Sînor û Dewlet Bi Nêrîna Kilambêjên Kurd/173

Sedîq Seîd Rewandîzî: Soyolojiyayî Rohelat le Şe'erekî Abdulah Peşewa da/201

Îlyas Suvagci: Di Helbestên Cegerxwîn de Vebêja Dekolonyal/207

Özlem Belçim Galip: Mal Li Kû Ye? Di Rabêja Romana Kurdî ya li Swêdê de,
ji Nû ve Nirxandina "Kurdistan" û "Diyaspora"yê/219

Dawîd Yeşîlmen: *Hêlîn* û Zarokîya di Nav Sînoran de/239

Mesûd Serfiraz: Di Helbestan de Parçebûna Kurdistanê/249

Fuadê Bacinî: Komkujiyek li Ser Xetê: Komkujiya Eleqemşê
û Dengvedana Wê di Wêjeyê de/257

Mehmet Çetin: Bandora Sînoran li ser Mela û Şairekî Kurd:
Mele Îzedînê Xweşîko/267

Zîndan Fıdancı: Di Romana Eliyê Evdilrehman,
Morof de Hêmayên Revê û Reva ji Kurdistanê/277

Hamit Bozarslan: Di Sînemayê de Temsîla Kurdan/285

Roportaj: Sabahattîn Gultekîni Reyde Roportaj; Zîwan û Xebata Zîwanê
Kirmanckî Ser o... Roportajkerdox: Abdullah Çelik/293

Gulbahar Koker-

Îbrahîm Seydo Aydogan: Di Romana *Ez ê Yekî Bikujim* de Hesta Tolhildanê/303

Musa Ekici-Sara Anter: Romana Kurdî ya Sovyetîk û Saqoyê Gogol/313

Fadime Ekici: Li Cem Hesenê Metê Mijara Rewşenbîrekîyê/317

Hélène Celissier: Zarok Weke Babet li Cem Lorîn S. Dogan/323

Murad Aygûn: Îqtîdar û Zîwanî Reyra "Obîn" Bîyayîşê Cumayê Bêziwanî/327

Rohelat Aktulum: Kitabêko Musnayoxî Ra Çi Musîyeno?/333

NIVÎSKARÊ RUMETÊ: Hozan û Nivîserê Xewn û Xeyalan: Xelîl Duhokî/339

Ebdela Şêxo: Xelîlê Duhokî û Çîrokbêjiya Keskesorî/342

Yaqub Tilermenî: Haware Li Kurdîniyê: Dîsa Qirkirin!!!/346

Ahmed Kanî: Bi Xelîl Duhokî re Hevpeyvîn/351

Bawer Berşev: Rewşa Aktuel a Wêjeya Kurdî: Li ser Encamên Lêpîrsînê/359

Pirtûkxane: Amadekar: Bawer Berşev/364

DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE VEBÊJA DEKOLONYAL

Destpêk

Di edebiyata kurdî de wexta ku dibêjin helbest û helbestvan ji bilî navên klasîk ji nav kesên ku pêşiyê tîna bîra mirov de em rastî navê Cegerxwîn tîna. Heta niha li ser Cegerxwîn û helbesta wî gelek lêkolîn û nirxandin hatine kirin, li ser wî tez hatine nivîsandin. Bêguman di nav wan de nivîs û lêkolînên gelek hêja û sîdewar jî hene lê gelek jî jê dubare ne. Lewma ger kesek li ser Cegerxwîn binivîse divêt tiştên nû bibêje. Em hêvî dikin ku ev nivîs jî nebe ji nivîsên dubare yê derheqê Cegerxwîn û helbesta wî de.¹

Me jî bi vê lêkolîna xwe xwest ku di helbestên Cegerxwîn de ya li ser vebêja dekolonyal rawestîna ka gelo Seydayî bi çî awayî di helbestên xwe de vê yeke pêk tîne? Ka gelo di helbestên wî de dînamîkên serhildanan û hişê dekolonyal çawa tîna honandin, em di helbestên wî de nîşaneyên serhildanên dekolonyal yêna gelên bindest dibînin ya ne? Wêk Ania Loomba jî destnîşan dike² ji bo ku em bikarin lêkolîneke wîha bikin divê em helbestên Cegerxwînî li gorî şert û mercên axa xwe, civaka xwe binirxînin û bizanibin ka gelo ji bo Kurdistanê mêtîngerî tîna çî wateyê. Bi vê yekê em dikarin bigihîne encamekê. Em ê helbestên Cegerxwîn

1 Ev nivîs pêşiyê bi şewirmendiya Remezan ALAN weke spartek hatiye amadekirin; pişt re li ser hinek guhertin hatine kirin.

2 Loomba, Ania, *Koloniyalizm/Postkolonyalizm*, wer. Mehmet Küçük, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2000, r. 211.

zêdetir di çarçoveya van mijararan de binirxînin; li ser bindestiya kurdan û rizgarkirina Kurdistanê, li ser beg û axa û şêxan, li ser lehengên dîrokî û mîtolojîk, li ser xwendin, zanîn û xizaniyê, li ser karker û gundî û cotyaran, li ser îslamiyetê. Armanca me bi vê dabeşkirinê ne ew e ku xebateke tematîk bikin, em bi vê re dixwazin destnîşankirina vebêja dekolonyal li ser hîmê lêkolîneke tematîk ava bikin.

Derheqê Vebêja Dekolonyal de

Kolonyalîzm bi xwe pêvajoyek e, ku sedan salan bi alîkariya lêkolînên zanistî, bi fethkirin û zordariya mêtinkariya welat, ax û mal û milkên mirovên din e. Di vê pêvajoya dirêj de mêtinkar li ser hemû taybetiyên koloniyên (dîrok, çand û ziman, hwd.) lêkolînan dike. Vebêja dekolonyal di nav lêkolînên discursa (vebêja) kolonyal de cih digire. Lewma dekolonyalîzm derketina ji kolonyalîzmê ye. Ji ber vê yekê ger em bikaribin discursa kolonyal rave bikin em ê herwiha bizanin ka gelo vebêja dekolonyal çi ye û li ser çi ava dibe. Lêkolînên vebêja kolonyal jî zêdetir li ser hîmê têgeha agahiyê (*information*) û nemasûmbûna wê ava bûye. Eleqeya têgeha agahiyê, ya bi desthiltadariyê ve, ji aliyê Foucault ve hatiye destnîşankirin. Edward Said jî ji Foucault îstîfade dike û di berhema xwe ya bi navê *Orientalism* (Rojhilatnasî) de lêkolînan li ser vebêja kolonyal dike. Said ji bo ku ji nû ve lêkolîna kolonyalîzmê saz bike serî li têgeha “discours”ê dide. Li gor wî deqên edebî yên bi koka xwe ji Ewropayê derketine, seyahetname û nivîsên din di navbera Ewropayê û ji yên derveyî wê de dubendiyek ava kiriye. Bi vê dubendiyê him çanda Ewropayê hatiye avakirin him jî ji bo berdewamkirin û berfirehkirina hegemonyaya ku Ewropayê li ser dewletên din ava kiriye peywireke wê ya girîng heye. Lewma wexta ku E. W. Said ji bo jêpîrsîna desthilatiya kolonyal têgehên “çand” û “agahiyê” bi kar tîne ev yek di heman demê de dibe destpêka lêkolînên discursa kolonyal jî. Serdestiya kolonyal ya derheqê şerqê de discoursekê ava dike. E. Said jî vê discoursê di hilberîna edebî û hunerî de, di berhemên zanistî û polîtîk de, nemaze di lêkolînên rojhilatnasiyê de analîz dike. Lêkolînên li ser vebêja kolonyal ên di dema me de tên kirin ne bi tene şayesandina şixulîna desthilatdariyê ye herwiha ew; serhildan û dijîtiyên gelên kolonîzekirî jî teorîze dike. Di lêkolînên vebêja kolonyal de lêkolîner li ser klîşe û hêmayên derheqê kirdeyên kolonyal disekin. Ew dixwazin têkiliya agahiyê ya bi saziyên hiqûqî, aborî û rêveberiyê re derxînin holê. Dîsa jî divê bê destnîşankirin ku li ser analîza vebêja kolonyal lihevkerinek

an jî yekrengiyek tune ye. Ji ber ku analîza vegotina kolonyal ji silsîleya dîrok û nêzîkahiye fîkrî û polîtîk derdikeve holê, ew bûye mijara gelek nîqaş û nelihevkirinan.³

Di metnên edebî de vebêja dekolonyal ji aliyê E. W. Said ve wek "berxwedana çandî" tê binavkirin. Di civata ku hatiye mêtinkirin de bi daxwaza hesta civakbûnê û bi şûndexwestina axa xwe, nerazîbunên li hemberî sîstema kolonyal zêde dibin. Mane, berxwedana çandî li gorî E. W. Said, piştî nerazîbunên li hemberî mêtinkaran bilind dibe. Gelên bindest bi bergeriya xwedîbûna dîrokeke yekpare û welatekî ku parçenebûyî, li ber xwe didin. Di vê berxwedana ku xwe dispêre çanda neteweyî de; dirûşm, çîrokên gelerî, lehengên dîrokî, destan û roman hwd... cî digirin. Ev berxwedana çandî bi vegotîneke mêrane û bi alîkariya hêmayên ku li jor navborî, bîra civaka bindest hişyar dike, welatê xwe yê beriya mêtinkariyê bi bîr tîne. Ciyê vebêjên fermî çîrokên koleyan, kurtejiyanên bijarte, biranînên zindanan, dîroka biheybet, lehengên nemir digirin. Belku axa wan di bin destê dijmin de be, lê bi alîkariya vebêja dekolonyal ew di hişê wan de gerdenezad e; lewre ev vebêja dekolonyal ji bo şûndegirtina axa bindest, dibe çek.⁴

Kurdistan û Kolonyalîzm

Ji bo ku mirov bikare lêkolînekê li ser kolonyalîzmê û vebêja dekolonyal bike divê mirov pêşiyê tîkiliya Kurdistanê ya bi van tîgehên re destnîşan bike. Ger em Komara Kurdistan a Mahabadê nehêsibînin hîn jî em nikarin behsa dewleteke kurdan a serbixwe bikin. Ismail Beşikçi derheqê parçekirin û parvekirina Kurdistanê de behsa du hêzên sereke, îngilîz û frensiyên dike. Hevkarên wan monarşiyên ereb û farisan û kemalîstî. Wexta ku Kurdistan tê parçekirin û parvekirin ev yek di Rojhilata Navîn de ji bo avakirina emperyalîzmê, dibe fersendeke mezin. Ji ber ku tu dewletan tenê bi hêza xwe nikarin serhildanên kurdan bişkênin. Wan ji dewletên emperyalîst alîkarî girtine. Vê rewşê jî di Rojhilata Navîn de emperyalîzm bihêztir kiriye. Dewletên emperyalîst di şerê cihanê yê ewil de ji bo parçekirin û parvekirina Dewleta Osmanîyan bi peymanên nepenî li hev kirine. Wan bi van peymanan hewl daye ku axa Kurdistanê parçe bikin. Wexta ku dewleta Osmanîyan tê

3 Loomba, h.b. , r. 67-77.

4 Edward Said, *Kültür ve Emperyalizm*, wer. Necmiye Alpay, weş. Hil, İstanbul, 2004, r. 333.

perçekirin li ser erdnîgariya ereban dewletên serbixwe û yên mêtîngeh tîn avakirin. Lê Kurdistan di navbera van dewletan de tê parvekirin û axa wê tê îlheqkirin. Her çend ku bi Peymana Sevrê (1920) behsa avakirina Kurdistanê tê kirin jî bi Peymana Lozanê (1924) parçekirin û parvekirina Kurdistanê hatiye mîsogerkirin.⁵

Di Helbestên Cegerxwîn de Vebêja Dekolonyal

Helbestên Cegerxwîn ji aliyê mijarê ve her çend berfireh be jî mirov dikare bibêje ev mijar jî bo armanceke sereke digihine hev. Ev jî bindestiya kurdan û daxwaza ji bo rizgariya Kurdistanê, hişyarkirina gelê kurd e. Bi tenê helbestên wî yên li ser evîniyê ji aliyê mijarê ve hinek din şexsî ne lê gellek car ew jî wek alegoriyekê behsa kurdan û welatê wan dikin ku hatiye dagirkirin.

Li gorî Remezan Alan, helbestên Cegerxwîn ji bo sazkirina vebêja dekolonyal di helbesta kurdî de mînakên ewil in:

"...Cegerxwîn yekemîn helbestkarê fikra ji mêtinkariyê rizgarbûn e. Di vî şertê îttîfaqê, wek qonaxên tekamûleke şexsî, qulibiyê ser şoreşeke çînî. Dîsa bi gotina Said ew e 'axa xwe bi şûnde dixwaze' û 'cardin dixwazeli ser axa xwe bi cî bibe'..."⁶

Li gor R. Alan, Cegerxwîn helbestên xwe di nav perspektîfeke dîrokî de nivîsandine. Di vê perspektîfê de Cegerxwîn him li ser taybetiyên rêveberên kurdan yên duh û îro disekine, him jî behsa destketiyên duh û jidestçûyînên îro dike. Mezinên kurdan yên duh yên wekî mîr û began hemû gernas, mêrxas, hişyar û zana, serdar, fidakar, dilpak û canfida ne. Yên îro jî dijminê gelê xwe û altaxên mêtinkaran in, hemû jî serserî, çavsor, sitemkar, gurên har, hov û dijwar, diz û xwînwar in. Her wusa kurdên duh xwediyê sera, birc û qûnaxan, rêz, bustan û daran bûn, îro jî qeqqeba kewan, ji çîçek û nêrgizan tiştek nemaye:

Ka ew welat? Ka ew çiya?

Ka ew gul û mêr û giya?

Ka dengê wan berx û miya?

Ka ew sera birc û kelat? (Aşitî, r. 14)

5 İsmail Beşikçi, *Kürdistan Üzerinde Emperyalist Bölüşüm Mücadelesi 1915-1925*, weş. Yurt, Ankara, 1992, r. 41-60.

6 Alan, Remezan, *Bendname*, weş. Avesta, Stenbol, 2009, r. 224.

Her çend ku Kurdistana Başûr demekê di bin kontrola îngilîzan û Kurdistana Rojava di bin kontrola frensiyên de bûye, em dikarin bibêjin ku Kurdistan rasterast nehatiye kolonîzekirin. Lewma lêkolînên ku di edebiyata kurdî de li ser vebêja dekolonyal bînin kirin, ji lêkolînên ku li ser edebiyata gelên din ên ku welatê wan hatiye mêtinkirin dê cihêtir bibe. Lewma ew pêvajoya mêtîngehên din rasterast li Kurdistanê ne-bûye. Ew lêkolînên ku dê li ser têkiliya Kurdistanê û kolonyalîzmê bînin kirin li gorî van şert û mercan divê bînin kirin.

Cegerxwîn di helbestên xwe de bi vebêjeke dekolonyal qelama xwe wek çekê bi kar anîye; berê vê çekê pêşiyê dirêjî kurdên nebaş yê îro dibe, pişt re jî dirêjî mêtinkaran û nûnerên wan ên wek faris û ereb û roman. Gelo Cegerxwîn çima pêşiyê berê çeka xwe dide rêveber û serekên kurdên niha. E. W. Said ji bo ku rewşa rewşenbîrên gelê bindest destnîşan bike, gotina F. Fanon bi bîr tîne. Li gorî Fanon rewşenbîrê ku dixwaze rewabûn û mafê gelê xwe biparêze divê pêşiyê nişterekê li dilê gelê xwe bide. Lewre bi raya me Cegerxwîn jî weke gelek rewşenbîrên beriya xwe zewalbûna darê (Kurdistan) ji kurmikê wê dîtîye. Ger ew kurmik -di helbestên wî de ev kes axa û şêx û mîr û beg in- nebin çi xisar nagihê darê, dê her û her li ser koka xwe bimîne, wê li hember mêtinkaran bisekine. Beg, axa û şêx bi zilma ku li gelê xwe dikin, dibin alîkarê mêtinkaran:

Xwedêkî bêje, beg çi ye?

Ji dijminan re beqçî ye

...

Gava ku dijmin tê welêt

Her tiştî pêşkêş dikî

...

Begîtî ritba dijmin e

Qey xizmeta dijmin dikî (Sewra Azadî, r. 33)

Cegerxwîn dibêje; ew welatê kurdan e, lewre navê wê Kurdistan e. Ne welatê axa û began e. Ger wusa bûya dê jê re axistan û begistan bihata gotin. Ger dijmin bûbe pehlewana, ev jî ber beg û axayên hevalên wan wusa li meydanê xurt bûye.⁷ Lewre heçî beg û axa û şêx in, divê bi daran li wan bê xistin û serê wan bê pelixandin.⁸

Wexta ku mêtinkar ligel bindestan guftûgo dikin, her kesê muxatab nagirin. Bi bijartina kesên ku wê alîkariya wan bikin, hiyerarşiya xwe

7 Sewra Azadî, r. 45.

8 Hêvî, r. 31.

ya halê hazir xurttir dikin.⁹ Lewre, gelo em dikarin bibêjin ku Cegerxwîn li dijî vê yekê bû, ji ber vê zêdetir êriş dikir li ser axa, beg û şêxan:

*Şêx û beg û axa ne ko, em dane bin destê neyar
Li ser me xo bilind dikin, bê şerm û bê eyb û fedî
(Kî me Ez, r. 138)*

Mêtinkar; piştî pêvajoyeke dûr û dirêj, herî dawiyê dixwazin li her derê cîhanê keşf bikin û bigirin bin kontrola xwe. Ji ber vê yekê mêtinkarî kiryareke tundî ya cografî ye. Di edebiyata berxwedana dekolonyal de jî li dijî van kiryanan, şûndexwestina axa xwe, hezkirina welatê xwe, bi awayekî eşkere diyarkirin û binavkirina sînorên wê tê kirin:¹⁰

*Em welat xwe nadin bi Berlîn
Deşt û latên xwe nadin bi Çîn
Welatê me yê bilind ê şêrîn (Agir û Birûsk, r. 118)*

*Welatê te ji Derya Spî ta biçî Pingava Hurmiz
Û ji Sêwas diçî ta digihête bi Taran û Rey-Rey
(Aşitî, r. 55)*

Li gor A. Loombayê serhildanên li hemberî mêtinkaran îlhamê didin hevdu.¹¹ Em dibînin ku Cegerxwîn jî carna serhildanên wek; Kûba, Asya, Efrîqa, Viyetnam, Hîndistanê di helbestên xwe de bi bîr tîne. Mêtinkar, emrîkî û îngilîz in. Ji ber marksîstbûna xwe Cegerxwîn Sovyetan wek mêtinkaran nabîne. Li gorî wî, Sovyet bîrewer in, dostên kurdan in, mirovên çê ne.

Kurdistan rasterast ne di bin hukma mêtinkaran de ye, lê di bin destê dewletên girêdayî mêtinkaran e. Ev dewlet dixwazin Kurdistanê di bin nîrê sistema mêtinkaran a navneteweyî de bigirin. Rêveberiyên van dewletên ku li ser erdnîgariya Kurdistanê jî mêtinkaran re altaxiyê dikin, ji mêtinkaran zêdetir paşverû, hov û wêranker in.¹² Cegerxwîn jî di helbestên xwe de dijberî vê yekê disekine:

*Dijminê millet, dost imperyal
Ji dijmin re ew tim dost û heval*

9 Loomba, *Kolonyalizm/Postkolonyalizm*, r. 259.

10 Said, *Kültür ve Emperyalizm*, r. 357.

11 Loomba, *Kolonyalizm/Postkolonyalizm*, r. 211.

12 Beşikçi, İsmail, *Kürt Aydını Üzerine Düşünceler*, weş. Yurt, Ankara, 1994, r.87.

...
Bimrin koledar, bimrî imperyal
Mirov tev bijîn serbest û heval
Tu car impêryal nabin dostê te
Tenê dixwazin bixun postê te

Leşkerê pir hov bikşêne Taran
Dijîn û namirin Kurd û Kurdistan (Aşîfî, r. 65- 69)

Di her têkiliyeke mêtinkariyê de rêgeza ewil ev e ku, di navbera kesên ku bi rê ve dibin û tîn îdarekirin de hiyerarşiyêke mutleq heye.¹³ Ev hiyerarşî di helbestên Cegerxwîn berevajî tê kirin.

Ji bo ku helbestkarek li hemberî kolonyalîzmê bisekine carna divê ew sînorê kesên bindest û yê serdest (mêtinkaran) bi awayekî eşkere destnîşan bike. Bi vê yekê mirov wê bizane ka gelê bindest çi winda kiriye û ji bo wan qîmetê van tiştan çi ye? Wexta ku helbestkar van bi bîr tîne ew di heman demê de bîra gelê bindest jî zindî dike û ev yek jî bi xwe re serhildanan tîne. E. Saîd van serhildanên ku bi riya çand û hunerê dest pê dikin wek “berxwedana çandî” bi nav dike.¹⁴ Di helbestên Cegerxwîn de ev vebêja ku li ser dukirdeyan (“me” û “wan”) ava dibe û van her du aliyan dide ber hev, ji bo honandina vebêja berxwedana çandî her çend ku riyeke guncan e jî em wek kirdeyan ji bilî “me” û “wan” dengê kesên din nabihîzin:

Navên me tev guhertin
Da bibêjin ne Kurd in

Lê bizane ey neyar!
Zivistan çû tê bihar

Ew giyayê bin kevir
Şîn tê rojek diçî der

Bijîn Kurd û Kurdistan
Nema dibî kolistan (Ronak, r. 85)

13 Said, *Kültür ve Emperyalizm*, r. 342.

14 Said, h.b., r. 338.

Ji bo ku netewa bindest bikare axa xwe ji mêtinkaran bistîne carna dikeve pey şopa lehengên dîrokî yan jî xwe dispêre dîn û mîtolojiyê. Bi vê yekê ew yekîtiya xwe li ser hîmê neteweperweriyê ava dike. Bingehe wê jî nasnameya civakî, dînî û nijadî ye.¹⁵ Lewre divê em bibêjin ku di helbestên Cegerxwîn de dîroka kurdan li ser dijîtiyên çînî hatiye honandin. Ew ji bo rizgariya Kurdistanê di dawiyê de, her car bang li lehengên kurdan ên dîrokî û mîtolojîk dike. Cegerxwîn bi vê yekê bingeha vê berxwedana çandî danaye. Bi berxwedaneke ku xwe dispêre dîroka kurdan a biheybet, bi yekîtiya karker û cotkar û perîşan û rebenan, em dikarin konê xwe li warên xwe yên kevnar vegirin.

Xwendekarên ku di dibistanên mêtinkaran de tîr perwerdekirin li gorî armancên mêtinkaran, jî dîrok û çand û zimanê xwe tîr dîrxistin. Dîroka wan berevajî tîr kirin, bi çavekî biçûk tîr mêzekirin. Gelên bindest jî li hemberî vê yekê dîroka xwe bi awayekî biheybet nîşan didin. Ji ber vê yekê di helbestên Cegerxwîn de dîrok ciyekî girîng digire. Wek helbestkarê îrlandî yê neteweyî W. Butler Yeats, di helbestên Cegerxwînî de jî “netew û dîrok ji hev nayê veqetandin”. Wek E. W. Said di pirtûka xwe de gotina Frantz Fanon bi bîr tîne, gava ku mêtinkar gelan digirin nav lepên xwe, tîr nabin û mêjiyê wan û rabirdûya wan jî berevajî dikin, jî holê radikin.¹⁶ Berevajîkirina mêjiyê gel, tîr maneya tunekirina mêjûya wan jî. Ji ber vê yekê di helbestên xwe de Cegerxwîn ewqas girîngî daye dîrokê û lehengan.

Di van helbestên ku dîroka kurdan, şer û pevçûnên wan tîr zimên de, navê gelek êl û binemalên kurdan jî derbas dibin. Ew carna Hewrî û Mîtan in, carna jî Mukrî û Loran in. Lê bêguman di helbestên Cegerxwîn ên dîrokî de para herî mezin dîwana wî ya bi navê *Şerefnameya Menzûm* digire. *Şerefname* behsa dîroka mîrekiyên kurdan dike û ji aliyê Şerefxanê Bedlîsî ve hatiye nivîsandin. Cegerxwîn vê berhemê kurt dike û bi awayekî menzûm jî nû ve dihene.¹⁷

Çi helbestên li ser lehengên dîrokî û mîtolojîk, çi yên li ser bindestiya kurdan û rizgarkirina Kurdistanê, di hemû helbestên xwe de Cegerxwîn dixwaze gelê xwe hişyar bike; lewma wek berî niha me destnîşan kir, dikare bê gotin ku “hebûn û erka helbesta Cegerxwîn şiyarkirin e”¹⁸:

15 Said, h.b., r. 329-340.

16 Said, h.b., r. 336-355.

17 Cegerxwîn, “Gotinek Pêdivî”, *Şerefnameya Menzûm*, Pêşgotin: Dilawer Zengî, weş. Avesta, Stembol, 2003, r. 9.

18 Alan, *Bendname*, r. 225.

Lê ev şiyarkirin bi tenê di derbarê nezaniyê de nîne, her wusa li ser yekîtiya kurdan û li ser bindestiya wan jî ye:

Heta nebîn xwenda û jîr

Bê rêber û bê destegîr

Bê dewlet û gêş û wezîr

Bindestê turka bin bes e (Kî me Ez, r. 112)

Gelo çima Cegerxwîn, wek berpirsyarên vê pîsî û qirêjiya li ser me, kurdên niha dibîne? Ma qet gunehên kurdên berê tune bû? Ma gelo ev zingar bi tenê gihaye mêjiyê kurdên niha. Ji ber vê yekê jî em dikarin pirsra E. W. Said a derheqê “xwerexnekirina berxwedanên neteweyî” de bi bîr bînin. Em dikarin bibêjin ku di rexneyên Cegerxwîn de lihevkiirnek nîne. Wek R. Alan jî destnîşan dike “Wek marksîstekî, hidûdê nakokiya wî jî ji vir dest pê dikir.”¹⁹

Cegerxwîn di gelek helbestên xwe de, rexneyan li îslamiyetê jî dike û ew îslamiyetê wek sedema têkçûna kurdan dibîne. Ev rexne jî zêdetir ji ber polîtîkayên mêtinkaran tê kirin. Li gorî Cegerxwîn altaxên mêtinkaranyên wek ereb, faris û tirk li aliyekê dibêjin em bira ne, dîne me, xwedayê me yek e; lê belê li aliyê din jî xwîna me dimijin. Dewletên mêtinkar hemû saziyên xwe li gorî fikir û kiryarên xwe bi kar tînin. Dîn jî yek ji van saziyan e.²⁰ Her çend ku di helbestên Cegerxwîn de bi awayekî êşkere peywireke dîni weke Beşikçi dest nîşan dike tune jî be em dikarin bibêjin ku Cegerxwîn mijara olê jî di nav çarçoveyeke çini de dibîne. Her çend ku dîne netewên mêtinkar û bindestan yek jî be, yê ku qels e her car gelê bindest e:

Kekê min ê misilman

Nahêlî têr bixum nan

Xwîna min tim dimijî

Dixwazî min bikujî

19 Alan, h.b., r. 228.

20 Beşikçi, *Kürt Aydın Üzerine Düşünceler*, r. 41.

*Ez xwe nakim çêlekew
Misilmani bû derew*

*Ola mezin zor û zêr
Heçî qels e diçî jêr*

(Aşitî, r. 29-30)

Encam

Di edebiyata kurdî de ger li ser vebêja dekoloyal lêkolîn bèn kirin, divê teqez ciyê Cegerxwîn jî bê nîşandan; ji ber ku di helbestên wî yên li ser bingehê çînî ava bûne û xisarên gelê bindest tûnin zimên, ji bo lêkolînên dekolonyal mînakên balkêş in. Di van helbestan de hebûna me (bindest) û wan (serdest) bi perspektîfeke dîrokî ji nû ve tê nîşandan. Ev dîrok jî li ser bingeha lehengan û mîtolojiya kurdan ava bûye. Ji bo helbestkarekî “di asteke maqûl de” ev rîyeke normal e. Lê belê me dît ku Cegerxwîn bi yek aliyekî ve li dîroka kurdan dinêre. Kurdên duh hemû baş û qenc bûn; ên îro nezan û bêtifaq û xulam in. Lewre wek helbestkarekî ji nû ve sazkirina dîrokê, ev yekalîbûn nakokiyek e. Her wusa vê nakokiyê rê li ber Cegerxwîn girtiye ku wek marksîstekî, Yekîtiya Sovyetan bi mêtînkariyê tawanbar bike.

Li gorî E. W. Said, W. Butler Yeats wek hemû helbestkarên dekolonyal ne bi tenê îdealîzekirina hestên gelê xwe yê bindest, her wusa hewl daye ku hestên dijminê xwe jî bîne zimên.²¹ Di welatê ku hatiye kolonîzekirin de temsîlkirina gelên di asta jêr de ji aliyê rewşenbîran ve pêkan e yan na? Gelo, ev gelên di asteke jêr de ne bi kîjan dangan diaxivin, bi dengên xwe yan jî dengên ku ji efendiyên xwe girtine? Wek Cegerxwîn di helbesteke xwe de dibêje, birastî jî kariye bûbe dengê “hejaran”? (Ronak, r. 33) Di helbestên wî yên herî şexsî de jî vebêja Cegerxwîn di asteke bilind de ye û ev helbest bi vegotîneke mêrane hatine nivîsandin. Her çend ku hinek helbestên wî ên wek “min go”, “wî/wê go” bi pîrs û bersivan didomin, em ji bilî dengê Cegerxwîn çend dangan dibihîzin jî bi fikra me em nikarin bibêjin ev deng bi ast û vebêjeke ku hestên hejaran tîne zimên, tê guhên me. Bi raya me ji ber hişkbûna dîdaktîzmê ev deng gelek caran bi ser îdelîzekirinekê neketiye. Cegerxwîn hinek din xwe ji dîdaktîzma ku ew girtiye nav lepên xwe xelas bikira, dê karîbûya dengê hejaran bilindtir bikira.

21 Said, *Kültür ve Emperyalizm*, r. 346.

Çavkanî

Alan, Remezan: *Bendname*, weş. Avesta, Stenbol, 2009.

Barnas, Rojen: "Şa'irê Ronahî û Hişyariyê Cegerxwîn", *Hêvî*, h. 6 (Tebax 1987), r. 7-26.

Beşikçi, İsmail: *Kürt Aydını Üzerine Düşünceler*, weş. Yurt, Ankara, 1994.

Cegerxwîn: *Sewra Azadî, Hêvî, Ronak, Zend-Avîsta, Agir û Pirûsk, Aşîfî, Kî me Ez Şerefnameya Menzûm*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2003.

Loomba, Ania: *Kolonyalizm/Postkolonyalizm*, wer. Mehmet Küçük, weş. Ayrintı, İstanbul, 2000.

Özalp, Davut: *Cegerxwîn*, weş. M, İstanbul, 2003.

W. Said, Erdward: *Kültür ve Emperyalizm*, wer. Necmiye Alpay, weş. Hil, İstanbul, 2004.

.....: *Şarkiyatçılık*, wer. Berna Ülner, weş. Metis, İstanbul, 2004.